

**Rojhilata Navîn di navbera bazar û
hevrikiyên nû de**

»»» R:8



**Newroz remz û serhildana
netewî ye**

»»» R:3

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

*Duhestînameyek Siyayî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (418) 21-03-2022 Buha (1000) Tûmen*

Newrozên Rojhelat

»»» R:4

**Bombexwazan dawî li civînên ji bo
rêkeftina etomî anîn!**

»»» R:7



Agirê îsal

li ser pişta dagîrker

hil bikin



Îdaregehê Rojhilata
Gîştî ya PDK

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Rojek nû û salek nû li rê de ye û jiyan dimeşe da ku xwe nû bike. Jiyana civakê pêk tê ji hizira hevpar a tev takên civakê û ji vê hizir û heşta hevpar, girêyên civakê têne darêtin da ku xwe weke hev bibînin û di bilindahiya nûbûna salê de, tev bi hev re bi yek heşt temaşeyê jîngeha civakanên xwe bikin û nîştimanek li ber çavê wan, xwe dixemlîne.

Mirovbûn erkeke gelek giran e ku çirke bi çirkeyên jiyana wê/wî hewce ye da ku bi berdwamî xwe bide nîşandan û wateyê bide bi hebûna xwe ku sînore di navbera xwe û canliberên bê wate de bide diyarîkirin. Virda mirovbûn ne tenê rêkvevêk asayî di navbera milyardan rêkevî de nîne, belkî erk e wek bicihanîn û vegeşînkirin, û erkeke ku digel çirkeyên jiyanê de neku lawaz û sivik nabe, belkî heta ku bilindtir diçe erkên mirovbûnê girantir û girantir dibe, û di bilindahiya mirovên mezin de dicirîske û bi rengê sor ê leşê wan dilop dilop xwînê pêşkêşê bi nîştimanê dike û navê bilind yê rêberên şehîd verdigerînin û sînoren nîştimanekê pênase dikin.

Ev erka giran ya mirovbûnê li xaleke din a li gerdûnê bo xalek din tê guhertin, çimkî cih tenê cografîyayeke bînaveroke, hişk û rût nîne, belkî derfeteke bona vegeşînkirina wate û hêmayan û her lewma jê re dibêjin nîştiman. Vira mirov nasnameyê verdigire û bi zimanekê dipeyve ku mirovên hevnasnameyên

Kurd bûn



wî/ê jê fêm dikin. Têgihîştin tenê fêmkirin ji ziman nîne, belkî kêşandina tev êş û azar û xweşî û nexweşiyên jiyana civakê ye ku li nav peyvên de cih girtiye û bi kenekê ziman dîlanê dike û bi renceke peyvê, xembar dibe. Lewma Kurdbûn pêk tê li pênaseya mirovek xwedî erk ku nîştimanekê taybet heye û bi hev re bi zimanê azar, xewn, xweşî û hêvî dipeyvin.

Di Newrozê de erkên mirovên Kurd bi tevahî xwe nîşan didin û di bin ronahiya agirê Newrozê de tev rih û rîşeyên pênase û nasnameyê bi hev re dîlanê dikin û nîştiman pê vedigeşe, her lewma Newroz tev demarên leşê xewn û hêviyên Kurdbûnê dimeşîne.

Manîfêsta Kurdbûn di bin meşxelên agirê Newrozê de û bi gotina sirûda Xweda tu nîştimanê avedan bike, bi dengê dîrokî û bi qîrîneke biqasî bilindahiya çiyayan, çiya bi çiya û gund bi gund, kolan bi kolanên bajar û çiyayên Kurdistanê digere. Ev manîfêsta, banga bilind a serhildan, vejîyan, xweragirî û ti demekê nayê rawestan. Manîfêsta Kurdbûnê, sirûda “Ey Reqîb” bi meşxelên Newrozê ve û bi rêzbandî û bihevrebûna mirovên xwedî erk yê Kurdistanê ber bi bilindahiyê ve tê hilkişandin.

Newroza Kurdbûn û erkê me yê mirovayetiye pîroz be.



Newroz remz û serhildana netewî ye



N: Noredîn Sofîzade

Berî her tiştî, bi dil û can bi hilkevta cêjna Newrozê û hatina sersala Kurdî, û nûbûna sirûştê, ez ji malbatên serbilind ên şehîdên Kurd û Kurdistanê re pîrozbahiyê dibêjm, û xebatkar û evîndarên azadî û serbestiya Kurdistanê, û bi giştî hemî xelkê welatperwer ê Kurd, û hêvî dikim ku Newroz û sala nû bibe destpêka hasilbûna daxwaziyên wan yên şexsî û neteweyî.

Newroz wekî cêjneke kevnar a netewa Kurd, bûye remiz û coşeke mezin daye bi çêkirina yekîtî û yekrêziyê, her ev yeka ye ku berdewam hikûmetên dîktator û bitaybetî hikûmetên dagîrker ên Kurdistanê ji Newrozê ditirs in.

Di wê nivîsînê de ez naxwazim basê felsefê û dîroka Newrozê bikim, bêguma li vê derheqê de gelek hatiye gotin û nivîsîn û renge gelek rayên cuda û heta dijberî hevdu jî hebin, belkî ez dixwazim basê bandora vê minasibeta Netewî bikim li ser yekîtî, xebat, berxwedan û serhildanê di nav gelê Kurd de.

Dema ku em dibêjin Newroz cêjna yekgirtin û yekîtiyê ye, û dijminên Kurd û Kurdistanê berdewam dijayetiya vê cêjnê kirine, ji ber hindê ye ku bi wê hilkevî hemî salê bi nêzî bûna Newrozê, gelê me devra hevdû kom dibin, û her çiqas nerehetî û kêşe hebin jibîrî dikin û dest dadinê nav destê hev û yekîtî û yekgirtinê di nava xwe de çê dikin, ewa jî tişteke ku hertim dijmin û degîrkerên Kurdistanê jê ditirs in, lewra bi hemî awayekî cehdê dikin berahîka



vê yekîtî û yekgirtin û devra hevdû kombûna Kurdan bigirin.

Dema ku em dibêjin Newroz cêjna şadî û xweşiyê ye, bêguman bi vê hilkevî dema ku gelê me bona pîroz kirina Newrozê devra hevdû kom dibin, bo demekî kin bejî hemî êş û kederan bîra xwe dibin û govend û şahî û dîlanê lidarixin, dijminên Kurdan jî ku cehd kirine Kurdan tune bikin û bi zilm û tepeserî û kuştar û barandina agir û asin û barûtê li ser Kurdistanê de, di cehda hindê da bûne ku nehêlin Kurd xêr û xweşî û şadiyê bibîne, belkî cehda wan ev bûye ku para Kurdan şîn, girî, xem, birîn û êş be, lewra bo evê ku hekî bo demekî kurt bejî, dixwazin pêşiya wê xweşî û şadiya Kurdan bigrin û Newrozê qedexe dikin.

Dema ku em dibêjin Newroz cêjna xwedî derkevtin ji remiz û sembolên neteweyî ne, di demekê de ku dagîrkerên Kurdistanê înkara nasnameya Kurdan dikin û bi hemî awayekî dixwazin gelê me asimîle bikin û di cehda helandin û jinav birina çand û wêje, kelepûr û dîrok Kurdan didin, em dibînin ku gelê Kurd bi minasibeta cêjna Newrozê gel bi stran, helbest, û gotarên çêkirina heştaya netewî,

nasnameya xwe bi dost û dijminan didine xuyakirin û herwisa bi jixwe kirina kincên Kurdî, hêmayên wekî şal û şapik û axabanî û hewrî, çend qat zêdetir vê cêjnê dixemilîn in lewra, dijmin û dagîrkerên Kurdistanê dema wê bûka rengîn a girseya gelê me dibînin, ji hemî kiryarên xwe bona jinavbirina nasnameya Kurdan bê hêvî dibin, lewra bi hemî awayekî cehdê dikin ku cêjna neteweyî a Newrozê qedexe bikin.

Bi berçavgirtina wan mînakên serwe ku dijmin çima di cehda qedexe kirina Newrozê daye û jê ditirse, hindî zêdetir cehdê dikin daku bikarin berahîka bi rê ve çûna cêjna Newrozê bigrin, hindî givaşan zêdetir dîxîne li ser gelê de, hindî zêdetir êrîşî li ser kombûn û girseya xelkê li Newrozê dikin, hindî zêdetir dixwazin hêma û sembolên neteweyî qedexe bikin, bêguman ku netenê cehda wan bê encam maye û nekarîne bigihîjne armancên xwe, hinde din zêdetir gelê me bi coşekî bihêztir, bi îradeyekî qahîmtir, bi hestekî nasyonalistanetir, ji newroz û cêjna neteweyî a xwe xwedî derdikeve.

Gelê me bi berxwedana xwe, bi xebat û rabûna xwe, bi xwedî derkevtin ji nasname

neteweya xwe, bi serî neçemandina li hember dijminan de, kariye xwe biparêze û zindîbûna xwe biselimîne û nehêle asimîle bibe.

Hekî newroz bo xelk û gelên dinê re wateya cêjneke demkî û xweşiyê ye, bo gelê Kurd Newroz şoreş û rabûne û xwedî derkevtine ji man û mawcûdiyet û nasnameya xwe ye.

Di demekê de ku heya niha dehan gel û neteweyên cuda cuda li cîhanê de, li hember asmîle û givaşên zordestan de nekarîne xwe biparêzin û jinav çûne, ev bi hezaran sale neteweya Kurd kariye li hember êrîş û hêz û siyasatên herî dijwar û qirêje dijminên xwe de, xwe jinav çûnê biparêze û bibe neteweyeke herî xebatkar û şoreşgêr û zindî, renge Newroz yek ji sedemên pêşî girtina ji helandina Kurdan be.

Îca lewma hewceye hemî gelê me bi çavên yek ji pîvanên nasnameya neteweyî bera xwe bidine Newrozê û hertim bi rihekî netewî jê xwedî derkevin û Newrozê wekî çeka herî bihêz li hember dijminan de biparêz in.

Pîroz be Newroza 2722 ya Kurdan

Newrozên Rojhelat



N: Azad Kurdî

Newroz tên û diçin û hersal gelê kurd li hêviya Newroza nû û azadiyê dimînin. Êdî Newroz bo Kurdan ji cejneke neteweyî derbas bûye, weke sembolek bona berxwedan û xebatê li dijî dagîrker derdikeve. Sedem jî ev e ku zilm û bêdadî û binpêkirina maf û azadiyên gelê kurd li Rojhelata Kurdistanê û parçeyên din hêj didome. Mixabin rewş ne tenê baştir nabe, belkî her diçe xirabtir dibe bo Kurdan di hemû warên jiyanê de. Ev yek hez û hêviyê gel bona rizgariyê zêdetir dike.

Newroz belkî di nav gelên din ên Rojhilata Navîn de, bi rengên cuda ji kurdan tê pîrozkirin. Lê, bo kurdan cejna hilkirina agir û nîşandana îradeyê ye, herwiha qada govend û dîlanê ye bona kêfxweşî û hêvîdarbûn bi jiyan û pêşerojê. Ji ber ku çî neteweyeke bindest û bin zilmê, bê hêvî û îrade nikare rizgar bibe. Ji aliyekî din ve jî sembolek e bona tebayî, yekrêzî û pêkvebûnê ku bo gelê kurd girîng û pêwîst e lê, dijmin û dagîrker jê ditirsin.

Em Newroza îsal di demekê de pîroz dikin ku mixabin ji ber qeyrana nexweşiya COVID – 19 di hemû cîhanê de, li 2 salên borî cejnên Newrozê bi coşên taybet li Kurdistanê nehatin lidarxistin. Vê şewbê bandor kiribû ser hemû kombûn, civat û şahiyên, bi taybet jî Newrozên kurdewarî.

Rêjîma dagîrker a Îranê bi du şewazan hewlan dide ku Newrozên Kurdewarî qedexeyan asteng bike. Ji aliyekê pîrsa olî dike hêcet û îdea dike ku hilkirina agirê Newrozê û şahiyên wê li dijî



baweriyên Îslamê ye, mixabin gelek caran kesayetiyên olî yên kurd jî heman îdea û siyasatên rêjîmê li ser Newrozê dubare dikin, lê gelê kurd ji vê yekê zêdetir hişyar e ku bi van gotinên bê bingehe bihê xapandin. Ji ber ku Newroz û kurd xwediyê pêvajoyeke dîrokî ya dûr û dirêj in. Agir û şahiyên Newrozê yên Makû heta Îlamê di salên borî de selimandin ku vê hizrê hezkerên pîr kêm hene di nav civaka Kurdistanê de.

Aliyê din ê herî girîng ku rêjîma Îranê Newrozên Rojhelat asteng û qedexeyan dike, ev yek e ku rêjîm bi kombûn, kêfxweşî û yekgirtina gel di Newrozê de ditirse. Naxwazin ku ev tebayî û yekrêzî di çarçoveya yekgirtina neteweyî di nav kurdan de reng vede. Xaleke giring e û divê hemû raya giştî ya Kurdistanê bona nîşandan îradeya xwe, vî karî bikin ku daîrker û neyar jê hez nake û jê ditirse.

Rêjîma Îranê di vê çarçoveyê de, îsal zêdetir ji salên berî ferman daye dezîgeh û hêzên xwe, ku li hember Newrozên bajarên Rojhelata Kurdistanê astengan pêk bînin û rê nedin Newroz bihên pîrozkirin. Lê xuya dibe ku îradeya gelê me ji vê yekê bihêztir û mezintir e. Lewma jî, min di destpêka nivîsê de jî got Newroz bo gelê me êdî bûye qada berxwedan, xebat û nîşandana îradeyê bona rizgariyê.



Bajarê Xoremava

N: Rojnameya Agirî

Xoremava yek ji bajarên herî mizîn yê Rojhilatê Kurdistanê û navenda parêzgeha Loriştanê ye. Pêka serjimêriya navenda amara rejîma Îranê ya li sala 1395'an, heşîmeta wî bajarî 373 hezar û 500 kese. Bajarê Xoremavayê bilindahiya wê li asta behrê 1147 metr e û di navbera dol û newalên zagrosê hilkeftiye. Xoremava 193 kîlometran li bajarê Kirmaşanê, 246 kîlometran li bajarê Îlamê, 317 kîlometran li bajare Sine û 711 kîlometran li bajarê Urmiye dûre . Li bajarê Xoremavayê Kurdên Lor û Lek dijîn. Devoka sereke ya wî bjaarî loriya Xoremavayî ye û ji sedî 78 peyvên lorên Xoremavayê digel devoka Lekî hevparin.

Li cihê niha yê bajarê Xoremavayê de, li serdema Îlamiyan de, bajarek bi navê "Xayîdelû" hebûye û bajarê "Şapûrxaşt" li ser fermana Şapûrê duyem li ser wêrankariyên wê hatiye avakirin. Asewarên berê yên bicîh mayî vê yekê nîşan didin ku, bajarê Xoremavayê yek ji girîngtirîn bajarên serdema Sasaniyan bûye û Dêra Felekuli'eflak hêmayê wî bajarî ye.

Li bajarê Xoremavayê, cihên geştyarî yên dîrokî û siruştî bi wî awayî ne: "Minara Kelpîcan, Pira Şapûrî, Gêrdava Berdîn, Kevirê Niveşte, gola Kiyû û ... hwd. Ev bajara bo yekem car li Îranê de, ji aliyê nivîsîngeha navçeyî ya Saziya NY ve weke bajareke bêmînak li warê geştyariyê hatiye hilbijartin. Bajare Xoremava li newaleke xwedî hewayeke xweş û tijî av hilkeftiye. Ji ber hebûna kanî û şûnwarên dîrokî yên cuda, ev bajara li Rojhilatê Kurdistanê, weke ciheke girînga dîrokî û geştyarî û sruştî hatiye naskirin. Herwisa li derdora wî bajarî pir cihên geştyarî yên weke parka dariştan a Şorav



li bakur û parka dariştan a Mexmel Kêv li bakur heye. Dêra Felekuli'eflak

Dêra "Felekuli'eflak" bi navê dêra "Dazide Balaxane" jî, tê naskirin. "Felekuli'eflak" li ser girikî hindayê bajarê Xoremavayê de zale û herwisa li nêzîkî rûbar û li navenda bajêr hilkeftiye ku, girîngtirîn û berçavtirîn mîrata dîrokî ya wî bajarî tê hesbandin. Dîroka avakirina vê dêrê wedigere bo serdema "Sasaniyan". Li dirêjahiya dîrokê de dêra "Felekuli'eflak", bi çendîn navan hatiye naskirin ku, bi wî awayî ne: Dêra Şapûrê Xaşt, Dêra Xoremava, Dazide Balaxane, koşka Etabekan û ... hwd. Ev dêra han li serdema Qacariyan de bi navê "Felekuli'eflak" hatiye naskirin.

Derbasiya vê dêra han wedigere bo serdema "Sasaniyan", Sasaniyan bajarek bi navê "Şapûrê Xaşt" li nêzîkî navçeya niha ya Xoremavayê avakirin ku, piştê hat wêrankirin û li derdora sedsalên heftîya koçî de, Xoremavaya îroyîn avakirin. Guman heye ku dêra "Felekuli'eflak" hemen dêra "Şapûr Xaşt" be ku, li serdema Sasaniyan de wir hikûmetdarî û leşkerî hebûye. Ev dêra han li warê stratîjîbûnê de, li sedsalên çarem a koçî ya mangî de weke, navenda desthilatdariya "Alî Hesenoye û Genicwer" û li serdema "Alî Bûye" hatiye dest nîşan

kirin. Herwisa li serdemên derbazbûyî de li dêra han de karên wuha birê ve çûne: "Xezîneya hikûmetî ya malbata Bedr li sedsalên çarem a koçî de, navenda desthilatdariya Etabekên Lorên piçûk û Waliyên Loriştanê û herwisa li serdema Sefewiyan heta serdema Qacariyan de, û herwisa li serserdemên Pehlewî yekem û duyem de binkeya Leşkerî û cihê girtiyên siyasî bûye

Ev mîrata binirx, li sala 1349'an ji aliyê artêşê ve raştdestî Wezareta Çand û Hunerê ya wê serdemê ya Îranê hatiye kirin. Piştê li sala 1354'an li vê dêrê de muzexaneyê xelknasî hatiye lidarxistin û li wir şûnda bû bi muzexane. Muzexaneyê "Felekuli'eflak" di navbera dêrekê de ye ku, li serdema Pehlewî de çalakîyên xwe destpê kir lê, piştî şoreşa gelên Îranê ya li sala 1357'an çalakîyên wê hatin sekinandin. Wê muzexaneyê piştî şerê di navbera Îran û Îraqê de, dubare çalakîyên xwe destpê kirin. Herwisa li heyama salên 1385'an-86-87'an, bi sedema nebûna xizmetguzarî û Bûdceyê hate darxistin. Di wê muzexaneyê de zêdeyî li 50 şûnwarên dîrokî tên paraştin. Lorstan û siyasatên rejîma Îranê

Siyasetên rejîma Îslamî a Îranê yên li hember bajarê Lorstanê her wekî parêzgehên din yên Rojhilatê Kurdistanê, siyaseteke kolony-

alîstîye û herweke beşên din yên Kurdistanê di vê parêzgehê de jî, di navbera devokên cuda û olên cuda hertim hewla tevlihevî û afirandina aloziyan daye lê mixabin, di piraniya deman de serkevtî bûye.

Rejîma Îranê bi awayek berdewam di hebûna peywendiya parêzgeha Lorstanê digel parêzgehên din yên li Rojhilatê Kurdistanê tirs hebûye û hewl daye wê parêzgehê li Rojhilatê Kurdistanê veqetîne û nehêle xelk bi hev re bîr girêdan.

Ji aliyekî din ve jî, rejîma Îranê her weke parêzgehên din yên li Rojhilata Kurdistanê, di vê rewşa parêzgehê de rewşa hejarî û bîkariyê berfireh kiriye û hertim hewl daye ku ciwanên vê parêzgehê ber bi aliyê madeyên sirker bibe û welatîyên vê parêzgehê di bin sêytera xwe de perewerde bike.

Îro bi sedema hebûna torên civakî û çalakîyên partiyên Kurd di vê navçeyê de, welatîyên vê parêzgehê zêdetr ber bi aliyê hişyariya neteweyî û dîrokê ve tîrê rakêşan û herwisa ciwanên vê navçeyê bi hişyarî û heştkirina bi berpirsariyê tevli refên pêşmerge, rêzên welatparên raşteqîn yên Kurdistanê dibin û hilgîrê vê siluganê ne ku em tev ser bi neteweyeke mezin a bi navê "neteweya Kurd in".

Tawanên şer û qirkirînên li Efrînê



N: Mîstefa Oso

Her ji dema êrîşa Tirkîyê li ser herêma Efrînê ya Kurdên Sûriye di destpêka sala 1918'an de, bi hevkarîya hin grûpên çeteyên Sûriye, ku li dijî herêma Efrînê û xelkê wê yasaya navdewletî ya mafên mirovan û yasaya mirovî ya navdewletî bi taybet çar peymanên Cinêvê û protokolên wan yên zêde bê rawestandî tînin binpêkirin.

Van binpêkirinan daxuyanên Tirkîyê yên “xweparastinê”, “parastina sînoran” û “armanckirina aliyek taybet” bi tevahî berevajîkirin û nîşan dana ku armanca Tirkîyê ji êrîş û dagîrkeriya li ser herêma Efrînê tev ji bo ku gelê Kurd tine û qir bike bi rêya kuştinên biqest, koçberbarkirin, hawirdkirina Turkumen û Ereban li şûna kurdan, bîparkirin û zindankirina kurdan, binpêkirina bendên bingehîn yên hiqûqa navneteweyî, zêdebarî îşkence, destdirêjî, tundutîjiya cinsî, bîserûşûnkirina mirovan, apartheid, avakirina dîwarekî li derdora Efrînê, destdanîna li ser mal û milkên kurdan, deşteserkirina wan wekî êxsîr û barimte, berdîl, wêrankirina avahiyên sivîlan û yên xizmetguzarî, tendurîstî, bermahiyên olî û dîrokî bi rêya teqîn û topbarankirinên biqest..., talankirin, binpêkirina rûmeta kesane, şewitandina dar û dariştanan û ... hwd û herwisa pêkanîna kiryarên din yên ku şer û tawanên li dijî mirovahiyê wekî “sûc” tînin binavkirin.

Tawanên şer li gorî “peymanê dadgeha leşkerî ya navneteweyî ya li Nurnbergê ya sala 1945'an, bi van sûcan



deştînan dibin: “binpêkirina qanûn û adetên şer, di nav de kuştin, reftarên xerab yan jî sirgûnkirina sivîlan li herêmek dagîrkirî, kuştina dîlên şer yan serederiya xerab ligel girtiyên şer, kuştina rehîneyan, deşteserkirina milkên taybet û wêrankirina nehewceyên leşkerî”.

Ev tawan ji aliyê civaka navdewletî ve bi cezayên herî giran tînin cezakirin, ku sûcdar tîne darizandin çî wekî berpirsyar - dewlet - kesên xwezayî - kes bin, lê tawanên dijemirov pêktînin ji: sûcên kuştin, qirkirin, îşkencekirin, sirgûnkirin, kolekirin, terorîzm, binçavkirina neqanûnî û çewisandin ji ber sedemên siyasî, olî û etnîkî, çî tek yan kolektîf bin, û kiryarên bi vî rengî li dijî sivîlan li herêmên dagîrkirî tînin kirin.

Tawanên navborî dikevin di çarçoveya binpêkirina qanûnên şer ji aliyekî ve, ji aliyekî din ve her tawanek bibe ji aliyê deştîlatdariya dagîrkeriyê li dijî sivîlên li herêmên dagîrkirî bi tawanên dike mirov tînin binavkirin. Gelek rêxistin û rêxistinên mafên mirovan yên navdewletî, herêmî û xwecihî, li ser lêkolînên meydanî, belgeyên fîzîkî û belgeyên din yên bi hêz, piştrast kirin ku binpêkirinên Tirkîyê û komên çekdar yên Sûriyê yên girêdayî Tirkîyê li herêma Efrînê, ji dema destdirêjî û

dagîrkeriyê ve digehêjin asta “tawanên ceng û dijemirovahiyê”.

Di raporta Komîsyona Lêpîrsîna Navdewletî ya Serbixwe ya NY ya derbarê Sûriye de, di destpêka sala 2019'an de ev tişt hate gotin: “Sedemên bihêz hene ku em bawer bikin ku endamên grûpên çekdar li Efrînê tawanên şer, rehîngirtin, îşkence, talan û deşteserkirinê pêktînin...”, raporek Rêxistina Lêborîna Navdewletî, ku di Sibata 2019'an de hat weşandin, herwiha komên çekdar yên Sûriyê yên girêdayî Tirkîyê li Efrînê bi “binpêkirinan ji dema kontrolkirina deverê, di nav de deşteserkirin û talankirina milkên sivîlan, bikaranîna mal û dikanên sivîlan, tevî bikaranîna dibistan û xwendîngehan wek navend û baregehên leşkerî û ... hwd, û herweha girtina keyfî, îşkence û reftarên xerab” tawanbar kir, di raporteke Human Rights Watch de, di Hezîrana 2018'an de, “komên çekdar yên Tirkîyê, di nav de Artêşa Azad ya Sûriye, bi destdanîn, talankirina mal û milkên sivîlên Kurd li herêma Efrînê û bi wêrankirin, û bi hawirdekirina çekdar û malbatên komên çekdar yên li dijî Sûriye li ser mal û milkên kurdan bê qerebokirina xwidanên milk û mal tawanbar kir”, û têde hat ku “li gorî yasayên şer,

talankirin yan jî deşteserkirina milkên taybet bi zorê ji bo bikaranîna şexsî qedexe ye û dibe ku sûcê şer be jî di çarçoveya şerê li herêmê de, ku nabe çekdar deştê xwe dayînin li ser mal û milkên taybet heta ji bo bicihkirina êxsîrên xwe, û qanûnên şer jî wêrankirina milkên ku ji aliyê leşkerî ve ne rewşa ne, qedexe dike”.

Şermezarkirina tawanên Tirkîyê û grûpên çekdar yên girêdayî wê li herêma Efrînê û kar bo gihandina dosyaya wan ji bo deştîlatên navdewletî yên taybetmend - bi taybetî li pêş Dadgeha Tawanan ya Navdewletî - dimîne erkeki neteweyî yê her Kurdekî û niştîmanî yê her Sûriyekî û herwiha erkeki qanûnî û exlaqî ye.

Erk dikeve ser milê me hemûyan, kes, saziyên mafên mirovan û sivîl, partiyên siyasî, qurbanî û xizmen wan...

Her çend ku ev kar hêsan nîne ji ber berjewendiyên navdewletî û herêmî û bazarên ku hatine girêdan yên bûne sedema vê rewşa xirab, tal û trajîk, lê her divê em bi erkê xwe rabin heta mafên xwe ji deşt dijmin û dagîrkeran biştînin, wek gotina pêşiyên me ku piştî reşê rewşen tê.

Nerîna Lîderan



Kazimî:

Em Newrozê bikin derfeta îstiqrarê



Johnson:

Eger Putin bi ser bikeve li ser sînorê Ukraynayê ranaweste



Biden:

Putin tawanbarê şer e



Ehmedî Nejad:

Dixwazin Tirkîyê bikin sê perçe

Bombexwazan dawî li civînên ji bo rêkeftina etomî anîn!



N: Eskender Ceiferî

Mezintirîn bombexwazên Rojhilatan Navîn, berpîrsên rejîma faşîstên Tehranê ne. Di rojên derbasbûyî de rejîma Îranê careke din civînên ji bo rêkeftina etomî bi dawî anîn lê di hember de car din îdia kirin ku ew bombeyê naxwazin.

Ev jî di demekê de ye ku Berîtanya dibêje Îran tenê di 2 rojan de biryarê biştîne û rêkeftin bê kirin.

Di dema desthilatdariya Hesên Rûhanî de, roja 14ê Reşemeya 99'an, Mihemd- cewad Zerîf wezîrê derve yê rejîma Tehranê ragihand ku êdî rêkeftina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas. Lê di hember de welatên Berîtanya, Feranse û Almaniyayê ragihandibûn ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê.

Niha Rûsiye jî dixwaze dorpêçên li ser Rûsiyê jî bêne rakirin da ku ew rêkeftinê qebûl bikin. Lê belê Amerîka dibêje ew dorpêçên ji ber êrîşa Rûsiyê ji bo ser Okraynê nayên rakirin.

Pişt re Donald Trump ser-rokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê dewsa xwe da Joe Biden û dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkeftina etomî bi Îranê re. Di vê navberê de Rêformxwaz heftim dibêjin rêkeftinê dixwazin lê Sipaha Pasdaran dibêje nabe rêkeftin bê kirin.

Di rastî de armanca rejîma Tehranê berhemanîna bombeya etomî ye. Ew, demê

bi kar tînin û bi meyandina Oranyoma zêdetirî 20 ji sedî, nêzikî berhemanîna bombeyê dinbin.

Niha dewleta Biden jî dixwaze rê li ber Îrana Etomî bigire û ragihandîye ew dixwazin ji bo rêgirîkirin ji berhemanîna bombeyê ji aliyê Îranê ve her karî bikin.

Îsraîl jî bi Amerîkayê re hevnerî e û dibêje nabe Îran bibe xwediya bombeyê.

Komara Îslamî jî bersiva berpîrsên Îsraîlî û Amerîkî dabû û gotibû: Wê cihan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke. Piştî ku Donald Trump peymana etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amerîka jî xwest rêkeftina etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew libenda piştgirîya hevalbendên xwe yê Ewropî ne.

Tillerson got jî ku xelên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ewê cara yekê bi Cevad Zerîf hevtayê xwe yê Îranî û wezîrên derve yê welatên ku peyman îmza kirine re, bicivîn û mijarê gotûbêj bikin. Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amerîkayê bû, li ser helwesta Amerîkayê ya di derbarê Îranê de dabû xuyakirin ku helwesta neli-hevkirinê ya Donald Trump serokkomarê wê demê yê Amerîkayê ya derbarê Îranê de û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye.

Feranse, Berîtanya û Almanya difikirin ku eger Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji deşt bidin. Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nedan Ajansa Navdewletî ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegerînin ser maseyê. Lê bi daxuyaniya Zerîf, derket holê ku êdî Îran

rêkeftinê naxwaze.

DYA bi raportên çalakiyên etomî yê Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara wezaretê Derve ya Amerîkayê hemû wan pirsyan bersiv nade ku çima Amerîka di îmzekirina raportan de dudil e û sedem çî ne lê bi gotara Hesên Rûhanî zelaal dibe ku dorpêçên nû yê aborî, gefê li rêkeftinê dîkin. Rêkeftina etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlibûna welatên ewropî hatibû îmzekirin û li gora wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêmkirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin.

Îsraîlê jî destpêkê ve ragihand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin. Beriya niha jî berpîrsên saziya Nehêlana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye, lê çavên Ewropîyan li Amerîkayê ne. Her biryarekê ku Waşington distîne, ji wan re dibe bandor. Berîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yê Îranê demlîdest îmze bike lê Trump li pey planeke din digere.

Ji bilî berpîrsên bilind ên Îsraîlê, fermanarên wan jî didin xuyakirin ku eger rêkeftin bê kirin, Îrana Etomî, wê Rojhilata Navîn dagir bike.

Almanya, Berîtanya û Feransê ku rolele mezin di rêkeftinê de hene, dibêjin bi meyandina 20 ji sedî zêdetir a Oranyomê, êdî derfet ji bo rejîma Tehranê çê dibe ku zêdetirî berê bo ser cihanê bibe gef. Di beşeke din a daxuyaniyê de tekez hatiye kirin ku meyandina vê asta Oranyomê ne ji bo karûbarên pîzîşkiyê û ênêrjiyê ye lê belê li tevahiya cihanê, ev asta Oranyomê tenê ji bo karûbarên çek û berhemanîna bombeyê tene bikaranîn.

Li bendê ye di rojên bê de armanca rejîma Tehranê ji bo meyandina Oranyomê eşkere bibe.

Rojhilata Navîn di navbera bazar û hevrikiyên nû de



N: Ebdûlazîz Qasim

Piştî êrîşa leşkerî ya Rûsyayê li ser axa Ukraynayê di 24'ê Sibata borî de, ku hevrikî û nakokî di navbera Amerîka û Rûsyayê de li Rojhilata Navîn bi taybetî li ser hin dosyayên gerim peyda bû, bi taybetî li ser dosya Sûriyê û dosya bernameya navikî ya Îranê, zêdebarî bandora şerê Ukraynayê li ser asta aborî û bi taybetî li ser ewlekariya xwarinê li Rojhilata Navîn, nemaze li ser asta cihanê bi giştî ku nêzikî çarêk ji genim ji Rûsiya û Ukrayna ye, dîsa ku li ser asta cihanê bi rêjeya %75ê ji rûnê xwarinê “zeyta gulberojê” ji herdu welatan tê hinartin, di heman demê de ku herdu welat du jêderên sereke yên rûnê garis û ceh ne, û Ukrayna di sala 2021'an de, şûna Amerîka girt wekî mezintirîn welat bo hinartina ceh ji Çînê re.

Helbet sizayên darayî û aborî yên Amerîkayê û Ewropayê li ser Rûsyayê bandorek mezin li ser bazarên neft û gazê çê dike, ku Rûsiya li ser asta cihanê, zêdebarî genim û daxilûdan, yek ji mezintirîn çavkaniya neft û gazê ye û duyemîn mezintirîn hinartîyê petrolê ye, û piraniya petrola xwe difroşe Ewropayê, ku nêzikî 40% ji gaza Ewropayê dabîn dike, lewra zêdebûna nîrxê petrolê ziyanên aborî yên mezin digehîne piraniya dewletên kêr çavkaniyên petrol û gazê, bi taybetî li ser Çînê û Ewropa, herwisa li ser dewletên wekî Endonezya û Tirkîyê jî.

Bi kurtî dikarin bêjin ku bazarên cihanî ji encama şerê Ukrayna hatin hejandin, bihayê neft û zêr bilind bûn, û piştî belavbûna epîdemîya koronayê bargiraniyek zê-



detir li aboriya cihanê peyda kir, û ji bona qerebokirina zîyanên xwe, heryek ji Rûsiya, Ewropa û Amerîka li gorî berjewendiyên xwe dixebitin, Amerîka berdewam e li ser sepandina sizayên aborî yên zêdetir li ser Rûsiya, û ji bo vê yekê li alternatîfan ji neft û gaza Rûsî digere, wekî xuya dibe ku Amerîka û herwisa dewletên Rojavayê ji bo dabînkirina neft û gazê li radeya yekem pena bi dewletên Erebi yên kendavî dibin û dûr nîne ku qaşa nefta Îranê jî bikin bi rêya serxistina gotûbêjên Vîyêna û nûkirina rêkeftina Bercam.

Heta niha xuya nebûye ku dewletên Erebi dê razî bibin li ser daxwazên Amerîka û Birîtaniya bo zêdekirina hinartina neftê bo welatên Rojavayê, herwisa ku dewletên Erebi bi tirseke mezin serederiyê ligel hevrikiya di navbera Rûsiya û Amerîka dikin, bi baweriya min ku heta astêkî dikarin bêjin ku êrîşa spaha pasdarên Îranê ya terorîst û mûşekbarankirina Hewlêra paytext û herwisa biryara dadgeha Îraqê jî ya li dijî yasa nefta Herêma kurdiştanê bi awayekî dikeve di heman çarçoveyê de, ku Îran hewl dide ku Amerîka û Ewropa li ser îmzekirina rêkeftinek navikî neçar bike bi sîdwegirtin ji berfirehbûna nakokiyan di navbera Amerîka, Ewropa û Rûsiya

de, şerê Rûsyayê li dijî Ukraynayê û sepandina sizayên aborî li ser Moskowê, ku rêjîma Îran hewl dide bi awayekî serbixwe, dûr ji baladeştiya Rûsyayê, li Vîyênayê peymaneke nû ya navikî îmze bike û sîdeyek mezin ji firotina nefta xwe werbigire, û li aliyek din ku Îran dixwaze pêgeha xwe li Sûriyê bihêztir bike bi sedema mijûlbûna Rûsyayê bi şerê li dijî Ukraynayê, tevî ku taybetiyek mezin ya Sûriyê li rex Moskoyê heye, ku Sûriyayê beşek ji ewlekariya xwe ya niştimanî dibîne, bi taybetî ji ber ku baregeha Hmeymim çeperekî berevaniyê yê pêşketî yê Rûsyayê ye li Derya Sipî li hember NATOyê û li hember serbazgeha Încîrlîk li başûrê Tirkîyê, wekî xuyaye ku êrîşa Rûsyayê ser Ukraynayê bû sedema kêmbûna çalakiyên Moskoyê li Sûriyê, bi taybetî di asta leşkerî de, ku ev kêmbûn dikeve di xizmeta rêxistina çeteyên DAİŞ, Hizibulah û spaha pasdarên Îranê de. Jixwe dibînin ku hevahengiyek di navbera Rûsiya û Îsraîlê de li ser gelek dosyayên girêdayî Rojhilata Navîn bi taybetî li ser dosya Sûriyê heye, û niha dibe ku hevahengiyek din jî di navbera wan de li ser dosyaya navikî ya Îranê peyda bibe, nemaze ku Îsraîl her rêkeftinekî ligel Tehranê red dike. Li aliyek din ku her çiqasî

nakokî di navbera Amerîka û Rûsyayê de hebin lê, bi dîtina min ewlehiya Îsraîlê dimîne xaleka girîng ya hevbeş di navbera wan de, lewra ku şensê serxistina gotûbêjên Vîyêna nemaze piştî êrîşa spaha pasdarên terorîst li ser Hewlêrê kêr bûye, ku li Washington nerazî ji aliyê nûnerên dîmokratxwaz û herwisa ji aliyê komarîxwazan derdikevin li dijî îmzekirina rêkeftinê ligel Tehranê û derbarê vê yekê û di nûtirîn daxuyaniyên xwe de, şewirmendê berê yê Ewlehiya Neteweyî ya Amerîkayê, John Bolton, di hevpeyvînekê de ligel Îran International got ku hewlên rêveberiya Joe Biden ji bo gihîştina rêkeftineke navikî wek “nîşana lawaziyê” binav kir û tekez kir li ser pêwîstiya hilweşandina Komara Îslamî ya Îranê.

Bolton ji Îran Înternasyonal re got: nabe bawerî bi sozên Komara Îslamî ya Îranê bibin yên ji bo kêmkirina çalakiyên terorîstî li navçeyê li hember derxistina spaha pasdaran ji lišta terorê û got ku rêveberiya Joe Biden xeletiyêke trajîk dike.

Li dawiyê dikarin bêjin ku li navçeyê tiştek bê agahdariya Îsraîlê nabe û heta dihêt çaverêkirin ku şerê Ukraynayê bi navbeynkariya Îsraîlê li Orşelîmê bida

Jin li nav şer de



N: Vênûs Fayîq

W: Hesên Mukerem

Li dema şer û pevçûnan de, hertim jin weke qata bêdesthilat û qurbanî hatiye hesabkirin, ev nerîn û dîtingeha jî gelek caran li ragihandinan de dubare dibe, bo mînak dibêjin qurbanî wiha ne: Jin, zarok û kal.

Li demekê ku hêzên dijmn cihekî bombebaran dikin, ti cudahiyeke dinavbera jin, zarok, ciwan û kalan de dananên, wate ku xort çekê davêje milê xwe û şer dike ev bi vê wateyê nîne ku mên nabe qurbanî belkû, gelek caran jî digel jinê weke kesekî sîvîl dibe qurbanîyê bombebaran û êrîşên dijmnan.

Her vê dîtingehê wisa kiriye ku jinek bi sedema rewşên şer jiyana xwe jidest bide û dibêjin bûye qurbanî, û weke şehîd wê binav nakin lê, demaku li şer de mênê canê xwe jidest dide eger li eniya şer de jî nebe weke şehîd binav kirine.

Dibe ku li cem gelek kesan cudahiyeke hebe ev jî tenê wiha be ku, bi dirêjahiya dîrokê amadebûna jinê li meydana rûbirûbûna digel dijmn û şerkirinê de kêmtir û an kêmpêyda bibe ku jin dinav de cih girt be.

Heta ku temaşeyî hêzên leşkerî yê welatên cîhanê jî dikin, hertim piraniya leşkeran mên bûne û herwisa yê ku hêzên hereketkirin û serkirdayeti kirine jî, her mên bûne û herwisa yê biryara şeran dane jî her mên bûne, yê ku danûstandin pêk anîne bona yek alîkirina şer û dirêj-epêdan yan bidawî anînê her mên bûne.

Lê, çima vê dîtingehê hertim jin weke qurbanî pênase kiriye, di demekê de ku ev erk û berprisayetiye ku li demên dijwar de dikevine stûyê jinan, ti yek ji wan erk û berprisayetiye mênan kêmtir nînin?

Her bo mînak bilî vê hejmarê eger kêmtir jî bin ji wan jinên ku di eniya şeran de berxwedanî kirine û çek avêtine milê xwe û li hemberî dijmin sekinîne, jinên din dinav civakê de roleke çarenivîs saz lîstine, dema ku hevjin, kur, bav û an jî birayên wan li eniya şer de berxwedanî kirine.

Heta rola wan jinên ku weke çalakvan li warê cuda de li pêyxema lidarxiştina aştî û bidawîanîna şer, li dema destpêka şer de lîstine kêmtir nebûne, bilî wan jinên ku li nav refên xaneyên nehîni ên nav şeran de bi awayek bandordar çalak bûne û berprisayeti girtine stûyê xwe.

Her bi vê awayî be dikarin bêjim ku jinê li carekê zêdetir li dema şer de qurbanî daye. Lê, tenê ji ber vê yekê jî, nabe ku jinê bêdesthilat û bêhêz û beşdar nebûn li eniya şer de destebendî bikin.

Kêmtir nînin ev jinên ku di wan demên dijwar de, li hember jiyanêke dijwar de xwe ragirbûne û li ser pê xwe sekinîne, bona serperestîkirina malbatên xwe û herwisa bona dabînkirina dahata jiyan û birêve birina tev erk û berprisayetiyan li cihê nebûna mênan di nav malbatê de. Her bi vê sedemê ye ku şase jin weke kesekê bêdesthilat û lawaz pênase bikin, li dema destpêkirina şeran de heta ji ber vê ku renge çek neavêtibin milê xwe û li çeperên şer de rû bi rûyê dijmin nebîbin jî.

Di vê rojgarê de, me mînakên zef hene ku rêk weke mênan çek diavêjin milê xwe, mînakên me jî jinên Kurdîştana Rojavayê ne ku, li hemberî dirindetrîn dijmnê

serdemê bûn û canê xwe kirine goriyê wan pîrensîpên ku li pêyxema wê de çek avêtibûne milê xwe, û herwisa niha bi awayekî şewaza şeran guhertiye û tev bi sedema amûr û teknolojiya pêşkevî tîncam dan, jin li pişt çeperên şer de rola herî bandordar dilîzin, bitaybet yê ku sûd û lêhatîbûna wan heye ku, di vê demê de ji wan sûd tê wergirtin, weke li warê teknolojiya de weke çalakvanên medenî û birêvebirina helmetan bona bilind ragirtina morala xelkê sade û herwisa çekdaran jî, û xizmekirina bi leşkeran li pişt hêlên rûbirûbûna digel dijmin de, dinav nexweşxaneyan de pîzişk, pereştar(hemşîre) û kadrên nexweşxaneyan ku piraniya wan jinên.

Her bi vê sedemê ye ku, eger rêzbendiyek hebe bona cuda kirina qada bêdesthilat û lawazbûnê ku biraştî qurbanîyên şer û pevçûnan in, yê wisa nin ku yan bi sedema temen “piranî zarok yan kalin” yan bi sedema rewşekê ku şiyana cismî ya wan rêgire bona beşdarîkirina li şeperên şer de. Weke zarok û kalan, nexweşên dinav nexweşxaneyan de û herwisa xwedî hewcehiyên taybet û heta yê ji warê derûnî ve jî necihgîrin, yê han ku biraştî dibine qurbanî û şiyana û desthilata berxwedariya wan tune ye.

Lê, jin weke mên rola xwe dilîze û tev berprisayetiye xwe birêve dibe û di heman demê de jî dibe qurbanî. Û bona vê ku di demên wiha de biryar biştînin ku çi kesekê bêdesthilatê û çi kesekê xwedî hêze, ev yek hewcehi bi vê heye ku ji tev aliyan ve lêkolîn li ser tev ademîzadan bêncam dan, neku jinê cuda bikin û ne ji ber vê ku bêbawere û ji aliyê bêhêz û bêdesthilatiya wê ye yan tenê ji ber vê ku jin e.

Çimkû mijara hêz û bêhêzbûnê tişteke rêjeyî ye, ji kesekî bo kesekê din û herwisa li kesekî deşiyana encamdana tişteke din hebe û li

tişteke de şiyana û hêza tewav tune be.

Eger mijar xweragirtin be ji warê zaniştî ve jî, pir caran tekezî li ser hatiye kirin ku jin gelek ji mên zêdetir li hemberî diwariyan de xweragirtir e, li ser vê hesabî ku ev bixwe berprisayetiyan digire bi stûyê xwe û erkên xwe birêve dibe, zêdeyî vê jî ku endamek ji malbata xwe jidest dide ji warê heşt û soz ve, ji mênan zêdetir zirar û derbên derûnî dibîne.

Lê, komê faktor hene ku jinê dixîne di nav bazneyeke girtî û bêdesthilat û bêhêz de ku, ev cudahiya regezî hertim jinê bêdesthilat û bê îrade nîşan dide û di rêza xwarê ya mênan de cihgîr dike.

Herwisa faktora namûsê jî li hindek haletan de dibe faktoreke bihêz bona dîrxistina jinê ji meydana rikeberîyan de û li ser vê baweriyê ku jinê desthilata berxwedanîkirinê tune ye û herwisa şiyana berevanîkirinê jî tune ye û di piraniya civakên paremayî de hertim jin li ser vê esasî hatiye bikar anîn, bona derbe lêdana ji aliyê beramber li rêya destbirina bi şerefa jinan bi mebesta herifandina warê derûnî yê aliyê beramber û biçokda anîn û stûxwar kirina wan.

Herwisa ev jinên ku hatine bikar anîn bona piraniya karê sîxorîkirinê ku bi mebest lêxistina dijmin bûye, hertim weke xaleke reş a namûsî ji jinê ve zeliqandiye, her bi vê sedemê ye ku, hertim mênan hewl dane ku hevjinên xwe li dema rikeberî û aloziyan de dîr rabigrin û wan li meydana şer û pevçûnan û rûbirûbûnan dîr bixînin û li dawiyê de jî, li rêza xaneyê bêhêzbûn û bêdesthilatbûnê de rêzbendî bikin.

Her ev jî bi guhertina tewav ya kûltûra civakî û dîtingeha civakî li derheq jinê de, şiyana wan diguhere û dibe karek nû li wê derheqê de bêncam dan.

Aktorê Amerîkî ji bo Nûdem Durak daxwaza alîkariyê kir

Mark Ruffalo Aktor û derhênerê navdar ê Amerîkî **Mark Ruffalo** ji bo hunermenda Kurd Nûdem

Durak daxwaza alîkariyê kir ku di zindanê de ye. Ruffalo amaje bi wê dike, “Sûcê wê?

Stran. Stranên gelêrî yên gelê xwe yê Kurd dibêje.” Nûdem Durak sala 2015’an ji ber ştranên Kurdî bi tohm-eta “endamtiya rêxistinê” ji aliyê hêzên ewlakeriyê yên Tîrkiye ve hatiye girtin.

Hunermenda Kurd di du dozên cuda de cezayê 19 sal zindankirin lê hatiye birîn û niha di Girtîgeha Tîpa M ya Bayburtê de tê girtin.

Aktor û derhênerê navdar ê Amerîkî Mark Ruffalo li



hejmara xwe ya Twitterê banga azadkirina hunermenda Kurd Nûdem Durak kir.

Mark Ruffalo dibêje, “Ev mirova bedew, diloan, jêhatî di zindaneke Tîrkiyê de tê ragirtin. Sûcê wê? Stran. Stranên gelêrî yên gelê xwe yê Kurd dibêje.”

Aktorê Amerîkî her di wê peyama xwe de ji bo Nûdem Durak daxwaza alîkariyê jî dike ku ew hunermenda Kurd bê azadkirin. Ç: RÛDAW

Hunermendê Kurd Çiya hat destserkirin


Çiya Şenses Birayê hunermenda navdar a Kurd **Rojda Şenses**, Çiya Şenses ku bi xwe jî hunermendek berniyas ê Kurd e, li bajarê Stenbol a Tîrkiyê hat destserkirin. Rojda Şenses li ser hesabê xwe yê medyaya civakî peyamek belav kir û daxwaza azadkirina birayê xwe kir.

Rojda 18`ê Adara 2022`an di demjimêrên sibehê de hêzên ewlekariya Tîrkiyê bi ser mala hunermendê Kurd Çiya Şenses de girtin û ew destserkirin.

Li gor zanyariyan Çiya Şenses bo Rêveberiya Ewlekariya Cadeya Vatan a Stenbolê hatiye birin û heta niha sedema destserkirina wî nayê zanîn.

Çiya Şenses di heman demê de, birayê hunermenda Kurd Rojda Şenses e. Rojda Şenses derbarê girtina birayê xwe de, li ser hesabê xwe

yê medyaya civakî peyamek



belav kir û ragihand, Çiya Şenses sibehê bi operasyonekê hatiye destserkirin û rê bo parêzaran nayê dayîn ku hevdîtîne ligel bikin.

Rojda bo berdana birayê xwe bang li aliyên peywendîdar jî kir û tekez kir birayê wê heta niha ji bilî ştranên Kurdî ti tawanek nekiriye.

Hunermend Çiya Şenses xelkê parêzgeha Sêrta Bakurê Kurdistanê ye û yek ji edamên koma muzîkê ya bi navê “Koma Gulên Xerzan” e.

Heta niha gelek ştranên Kurdî gotine û çend albûmên wî hene. Ç: RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirovî di Kurdistanê de

Celal Vefayî” piştî bi dawîhatina heyama girtîgehê hate azadkirin

Roja Şemî 28`ê Reşemê, welatiyek Kurd ê bi navê “Celal Vefayî” kurê Hecî “Umer” û xelkê bajarê Bokanê piştî bi dawîhatina heyama girtîgehê hate azadkirin.

Roja Çarşemî 17`ê Sermaweza îsal, ew welatiye bo cîbicîkirina girtîgeha xwe hate binçavkirin û bo girtîgeha bajarê Bokanê hate veguhaştin.

Xermanana îsal, “Celal Vefayî” bi tohmata “piropagende li dijî nizamê” ji aliyê taya 101 a dadgeha keyferî ya bajarê Bokanê bi serokayetiya dadver “Peyman Roştêmî” bi 5 meh girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan.

Roja Yekşemî 27`ê Pûşperê, ew welatiye bi danîna barimteya 300 milyon Tumenî bi awayek demkî heta bi dawîhatina qonaxên dadresiyê ji girtîgeha îdareya Îtila`ata bajarê Bokanê hatibû azadkirin.

Roja Pêncşemî 24`ê Pûşperê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî êrîş kiribûne ser mala “Celal Vefayî” û piştî vekolîna mala wî, navbirî binçav kirin.

Ebdullah Rûzrox bi danîna barimteyê hate azadkirin

Roja Çarşemî rêkevta 25`ê Reşemê, welatiyek Kurd ê bi navê “Ebdullah Rûzrox” xelkê bajarê Merîwanê, bi danîna barimteyê bi awayek demkî ji girtîgeha wî bajarî hate azadkirin.

Ew welatiye bi danîna barimteya 500 milyon Tumenî bi awayek demkî heta bi dawîhatina qonaxên dadgehîkirinê ji girtîgeha bajarê Merîwanê hate azadkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, hêzên ewlehî telefona wî welatiyî zewt kirine û bi wî re nedanê.

Ew welatiye temen 52 salî ye û di heyama binçavkirinê de ji mafê “çavpêkevtin digel malbata xwe û destpêregihîştina bi parêzer” hatiye bêparkirin.

Roja Şemî 30`ê Rêbendanê hêzên ewlehî yên ser bi îdareya Îtila`ata bajarê Merîwanê, bi bê hebûna ti belgeyek yasayî “Ebdullah Rûzrox” li dûkana wî ya kincdûrînê li şeqama “Kurey Mûsewî” binçav kiribûn.

Navbirî bo lêpîrsînê bo girtîgeha îdareya Îtila`ata bajarê Sineyê veguhaştibûn û piştî bi dawîhatina heyama lêpîrsînê bo girtîgeha bajarê Merîwanê hatibû veguhaştin.

Heta niha ji sedema binçavkirin û tohmata ku li dijî wî welatiyê Kurd hatiye sepandin ti zanyariyek ber deşt nîne.

Welatiyekî xelkê Bakûrê Kurdistanê bi îdamê hate cezadan

Welatiyekî xelkê Bakûrê Kurdistanê yê bi navê “Hatem Ozdemîr” ji aliyê dadgeha Şoreş a bajarê Xoyê cezaya îdamkirinê bi ser de hatiye sepandin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, dawî kombûna dadgehîkirina “Hatem Ozdemîr” li dawîya havîna îsal li taya 1 a dadgeha Şoreşa bajarê Xoyê hatibû lidar xistin û dadgehê bi tohmata “bexî” cezaya îdamê li ser sepandine .

Herwisa wê çavkaniyê got: “Ew cezaye roja Sêşemî 24`ê Reşemê li girtîgeha bajarê Urmiyê bi awayek fermî bi wî welatiyê xelkê Bakûrê Kurdistanê re hatiye ragihandin.

“Hatem Ozdemîr” li 11`ê Pûşpera sala 1398`an piştî pevçûn di navbera hêzên Partiya Kedkarên Kurdistanê û hêzên qerargeha Hemze ya Spaha Pasdaran de li deverên ser sînoren bajarê Çardilanê, hatibû binçavkirin.

Navbirî di wê pevçûnê de bi sedema berkevtina gulleya xompareyê bêhiş bibû û piştî binçavkirinê bo girtîgeha Îtila`ata Spahê li bajarê Urmiyê hatibû veguhaştin.

Ew welatiye li dawîya meha Gelawêja sala 1398`an piştî du meh lêpîrsînê li girtîgeha Îtila`ata Spahê li bajarê Urmiyê bo girtîgeha wî bajarî hatibû veguhaştin.

Navnîsana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (418)

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdiştanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

[illegible]

12-4	FFFF	Explosion		
13	14	15	16	17
18	19	20	21	22
23	24	25	26	27
28	29	30	31	32
33	34	35	36	37
38	39	40	41	42
43	44	45	46	47
48	49	50	51	52
53	54	55	56	57
58	59	60	61	62
63	64	65	66	67
68	69	70	71	72
73	74	75	76	77
78	79	80	81	82
83	84	85	86	87
88	89	90	91	92
93	94	95	96	97
98	99	100	101	102
103	104	105	106	107
108	109	110	111	112
113	114	115	116	117
118	119	120	121	122
123	124	125	126	127
128	129	130	131	132
133	134	135	136	137
138	139	140	141	142
143	144	145	146	147
148	149	150	151	152
153	154	155	156	157
158	159	160	161	162
163	164	165	166	167
168	169	170	171	172
173	174	175	176	177
178	179	180	181	182
183	184	185	186	187
188	189	190	191	192
193	194	195	196	197
198	199	200	201	202
203	204	205	206	207
208	209	210	211	212
213	214	215	216	217
218	219	220	221	222
223	224	225	226	227
228	229	230	231	232
233	234	235	236	237
238	239	240	241	242
243	244	245	246	247
248	249	250	251	252
253	254	255	256	257
258	259	260	261	262
263	264	265	266	267
268	269	270	271	272
273	274	275	276	277
278	279	280	281	282
283	284	285	286	287
288	289	290	291	292
293	294	295	296	297
298	299	300	301	302
303	304	305	306	307
308	309	310	311	312
313	314	315	316	317
318	319	320	321	322
323	324	325	326	327
328	329	330	331	332
333	334	335	336	337
338	339	340	341	342
343	344	345	346	347
348	349	350	351	352
353	354	355	356	357
358	359	360	361	362
363	364	365	366	367
368	369	370	371	372
373	374	375	376	377
378	379	380	381	382
383	384	385	386	387
388	389	390	391	392
393	394	395	396	397
398	399	400	401	402
403	404	405	406	407
408	409	410	411	412
413	414	415	416	417
418	419	420	421	422
423	424	425	426	427
428	429	430	431	432
433	434	435	436	437
438	439	440	441	442
443	444	445	446	447
448	449	450	451	452
453	454	455	456	457
458	459	460	461	462
463	464	465	466	467
468	469	470	471	472
473	474	475	476	477
478	479	480	481	482
483	484	485	486	487
488	489	490	491	492
493	494	495	496	497
498	499	500	501	502
503	504	505	506	507
508	509	510	511	512
513	514	515	516	517
518	519	520	521	522
523	524	525	526	527
528	529	530	531	532
533	534	535	536	537
538	539	540	541	542
543	544	545	546	547
548	549	550	551	552
553	554	555	556	557
558	559	560	561	562
563	564	565	566	567
568	569	570	571	572
573	574	575	576	577
578	579	580	581	582
583	584	585	586	587
588	589	590	591	592
593	594	595	596	597
598	599	600	601	602
603	604	605	606	607
608	609	610	611	612
613	614	615	616	617
618	619	620	621	622
623	624	625	626	627
628	629	630	631	632
633	634	635	636	637
638	639	640	641	642
643	644	645	646	647
648	649	650	651	652
653	654	655	656	657
658	659	660	661	662
663	664	665	666	667
668	669	670	671	672
673	674	675	676	677
678	679	680	681	682
683	684	685	686	687
688	689	690	691	692
693	694	695	696	697
698	699	700	701	702
703	704	705	706	707
708	709	710	711	712
713	714	715	716	717
718	719	720	721	722
723	724	725	726	727
728	729	730	731	732
733	734	735	736	737
738	739	740	741	742
743	744	745	746	747
748	749	750	751	752
753	754	755	756	757
758	759	760	761	762
763	764	765	766	767
768	769	770	771	772
773	774	775	776	777
778	779	780	781	782
783	784	785	786	787
788	789	790	791	792
793	794	795	796	797
798	799	800	801	802
803	804	805	806	807
808	809	810	811	812
813	814	815	816	817
818	819	820	821	822
823	824	825	826	827
828	829	830	831	832
833	834	835	836	837
838	839	840	841	842
843	844	845	846	847
848	849	850	851	852
853	854	855	856	857
858	859	860	861	862
863	864	865	866	867
868	869	870	871	872
873	874	875	876	877
878	879	880	881	882
883	884	885	886	887
888	889	890	891	892
893	894	895	896	897
898	899	900	901	902
903	904	905	906	907
908	909	910	911	912
913	914	915	916	917
918	919	920	921	922
923	924	925	926	927
928	929	930	931	932
933	934	935	936	937
938	939	940	941	942
943	944	945	946	947
948	949	950	951	952
953	954	955	956	957
958	959	960	961	962
963	964	965	966	967
968	969	970	971	972
973	974	975	976	977
978	979	980	981	982
983	984	985	986	987
988	989	990	991	992
993	994	995	996	997
998	999	1000	1001	1002
1003	1004	1005	1006	1007
1008	1009	1010	1011	1012
1013	1014	1015	1016	1017
1018	1019	1020	1021	1022
1023	1024	1025	1026	1027
1028	1029	1030	1031	1032
1033	1034	1035	1036	1037
1038	1039	1040	1041	1042
1043	1044	1045	1046	1047
1048	1049	1050	1051	1052
1053	1054	1055	1056	1057
1058	1059	1060	1061	1062
1063	1064	1065	1066	1067
1068	1069	1070	1071	1072
1073	1074	1075	1076	1077
1078	1079	1080	1081	1082
1083	1084	1085	1086	1087
1088	1089	1090	1091	1092
1093	1094	1095	1096	1097
1098	1099	1100	1101	1102
1103	1104	1105	1106	1107
1108	1109	1110	1111	1112
1113	1114	1115	1116	1117
1118	1119	1120	1121	1122
1123	1124	1125	1126	1127
1128	1129	1130	1131	1132
1133	1134	1135	1136	1137
1138	1139	1140	1141	1142
1143	1144	1145	1146	1147
1148	1149	1150	1151	1152
1153	1154	1155	1156	1157
1158	1159	1160	1161	1162
1163	1164	1165	1166	1167
1168	1169	1170	1171	1172
1173	1174	1175	1176	1177
1178	1179	1180	1181	1182
1183	1184	1185	1186	1187
1188	1189	1190	1191	1192
1193	1194	1195	1196	1197
1198	1199	1200	1201	1202
1203	1204	1205	1206	1207
1208	1209	1210	1211	1212
1213	1214	1215	1216	1217
1218	1219	1220	1221	1222
1223	1224	1225	1226	1227
1228	1229	1230	1231	1232
1233	1234	1235	1236	1237
1238	1239	1240	1241	1242
1243	1244	1245	1246	1247
1248	1249	1250	1251	1252
1253	1254	1255	1256	1257
1258	1259	1260	1261	1262
1263	1264	1265	1266	1267
1268	1269	1270	1271	1272
1273	1274	1275	1276	1277
1278	1279	1280	1281	1282
1283	1284	1285	1286	1287
1288	1289	1290	1291	1292
1293	1294	1295	1296	1297
1298	1299	1300	1301	1302
1303	1304	1305	1306	1307
1308	1309	1310	1311	1312
1313	1314	1315	1316	1317
1318	1319	1320	1321	1322
1323	1324	1325		

[illegible]